Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1316 | 15-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Bexçeyê Şehîd Awaz qada pêşîn a amadekirina zarokan e’

Dilîn Ehmed/Qamişlo

**Bexçeyê Şehîd Awaz li bajarê Qamişlo yek ji wan cihên ku ji bo avakirina nifşê nû dixebite. Ew di avakirina kesayeta zarokan de xwedî bandoreke erênî ye. Ji bo avakirina xwebawerî, pêşxistina jêhatî û amadekirina derbasbûna zarokan a qonaxa seretayî, kar û xebatan dide meşandin.**

Li bajarê Qamişlo 40 bexçeyên zarokan hene, 2 jê girêdayî şaredariya bajare, lewra wan li ser xwesetka du şehîdên xwe ev bexçe ava kirine. Yek jê Bexçeyê Şehîd Awaz e.

Bexçeyê Ş.Awaz pêşwaziya zarokên ji temenê 3`ê heta 5` salî dike. Bexçe ji 4 refan pêk tê her refek ji bo bicihkirina temenekî ye. Refa 4`an jî ji bo zarokên pêkhateyên ereb e. Lewra bexçe girîngiyê dide fêrkirina zarokan ji bo zimanê dayîkê. Di bexçe de 8 mamoste û sê çavdêr dixebitin. Her refek du mamoste zarokan fêr dikin, çavdêr jî yek jê berpirsyara paqijiyê ye, yek pêşwazîkirina zarokan li ber derî dike û rêvebera giştî ya bexçe jî heye. Bexçeyê Ş.Awaz ne tenê bi vekirina dibistanan re deriyê xwe vedike, bexçe çile û havînê pêşwaziya zarokan dike. Lewra piraniya zarokan dayîkên wan di saziyan de dixebitin. Lê bi destpêkirina sala xwendinê hejmera zarokan zêde dibe, çimkî mamoste jî zarokên xwe tevlî dikin. Îsal jî bexçeyê Ş. Awaz pêşwaziya 80 zarokî kiriye. Derbarê xebatên Bexçeyê Şehîd Awaz ya bajarê Qamişlo, rêvebera bexçe Yasmîn Mihemed Şerîf ji rojnameya me re axivî.


Yasmîn Mihemed


Hêlîn Hemiko



### `Bexçeyê zarokan di avakirina kesayeta wan de xwedî bandoreke erênî ye`

Yasmîn Mihemed di destpêka axaftina xwe de wiha got; “Bexçeyên zarokan yek ji bingehên herî girîng ên perwerdekirina zarokan in. Ew ne tenê cihê lîstik û xweşbûnê ye, lê belê cihê fêrbûn, pêşketina karakterê zaroka ye. Di bexçeyan de zarok di fêrî rêbazê danûstandinan dibin, herwiha ew fêrî şîrovekirina hest û xeyalên xwe bi awayekî rast dibin. Ev qada pêşîn di jiyana wan de ye. Ya herî girîng jî ew e ku, ji bo dibistan û jiyana civakî wan amade dike. Ji ber vê yekê, girîngiya bexçeyê zarokan ne tenê li ser zarokê ye, li ser pêşeroja civaka me jî xwedî roleke girîng e.”

### ‘Pêwîstiya bexçe bi nûkirina sazkirinê heye’

Yasmîn Mihemed li ser zehmetî û pêwîstiyên bexçe wiha anî ziman: “Bê gûman li ser malbat û zarokan ne hêsane ku çend seatan ji hev qut bibin bi taybetî dema ku zaroka malbatê ya yekê be ku tevlî bexçe dibe. Ji vî aliyî de mamosteyên me pir zehmetiyan dikşînin, lê ya herî baş ew e ku, ev pirsgirêk dirêj nake. Lewra mamosteyên ku em wan ji bo bexçe hildibijêrin, divê xwendina xwe ya zanîngehê ya beşê fêrkirina zarokan bidawî kirin. Ji aliyekî din jî em dibêjin bila dilê malbatê bi taybetî dilê dayîkan reht be, çimkî em jî zarokan bi dilxweşî wan pêşwazî dikin û bi çavê zarokên xwe li wan dinêrin. Herwiha ji aliyê pêdiviyên bexçe em hinekî zehmetiyan dikşînin. Yek jê pêlîstokên zaroka ne, ji ber ku em ne tenê zarokan fêrî hejmar û tîpa dikin, ji bo ji bexçe hez bikim em piraniya saetyên wan bi lîstikan derbas dikin. Pêwîstiya nûkirina rengê bexçe ye. Lewra ya bala zarokê dikşîne, rengbûna derdorê ye. Pêwîstiya bexçeyê me bi sazkirinê heye. Şaredarî li gorî xwe pêdiviyên me bi cih tine lê têrê nakê, ji bo wê vê dibêjim eger rêxistinek hebe ku bi me re biba alîkar wê pir baş ba. Ji ber ku rehetî û kêfxweşiya zarokan ji bo me pir girîng e.”

Yasmîn Mihmed destnîşan kir ku ji bo zarok dîrok û çanda xwe nas bikin, ew ji wan re şahiyan li dar dixin û wiha got; “Ji ber ku mejiyê zarokan mîna rûpeleke spî ye, her tiştekî balkêş di mejiyê wî de dimîne. Ji bo ku zarok ziman, çand û hunera gelê xwe nas bike, em di her rojeke taybet de şahiyan ji wan re li dar dixin. Mîna roja newrozê, roja zimanê dayîkê, 8`ê Adarê û hwd.”

### ‘Li şûna mijola kolan û alavên teknolojiya wan tevlî bexçeyên zarokan bikin’

Rêvebera Bexçeyê Ş.Awaz Yasmîn Mihemed Şerîf Mihemed bang li malbatan kir ku, şûna zarok li kolanan bin, wan tevlî bexçeyan bikin. Yasmîn axaftina xwe wiha bidawî kir: “Bexçe ji bo pêşxistin û pêşketina zarokan tê avakirin. Ji bo wê li şûna zarok bi lêstokên kolanan yan jî bi alavên teknolojiya mijol bibin, bila tevlî bexçeyan bibin. Ji bo malbatê jî pir başe lewra zarok di cihê wisa teybet de, dibin xwediyê kesayete xurt.”

### ‘Ji bo di dibistanê de serkeftî bin, divê di qunaxa bexçe de derbas bibin’

Di hema çarçoveyê de yek ji mamosteyên Bexçeyê Ş. Awaz Hêlîn Hemiko jî wiha axivî: “Tevlîbûna zaokan ji bo bexçeyan pir girîng û pêwîste, lewra yê ku bihêla zarok di dibistanê de pêşketî be û xwedî kesayeteke taybet be, tevlînî bûna wan ya bexçeye. Ji bo wê divê malbat bi çavekî biçûk li bexçeyan nenêrin. Divê ne tenê zarokên ku dayîkên wan dixebitin biçin bexçeyan, divê zarok bi giştî di vê qunaxê de derbas bibe. Karê ku li bexçeyan tê meşandin ne karekî hêsna. Lewra em wekî mamoste zarokan ji jiyanekê derbasî jiyaneke nû dikin. Em jî bi avakirin û fêrkirina zarokoan pir kêfxweş dibin.”

Hêlîn Ednan Hemko axaftina xwe wiha qedand: “Xwendina ku em bi sala dikin ne hêsane, lewra em ji bo avakirina nifşê nû dixebitin. Ne tenê em herwiha rola malbatê zarkan jî heye ku bi mamosteyan re bibin alîkar. Ji aliyê pêşxistina wan ya xwendinê heriwha bi rê û rêbazên teybet hezkirina bexçe di dilê wan de biçînin. Bê gûman di hefteya pêşî de wê zarok ne bi hêsanî tevlîbûnê bipejirîne. Lewra ew ji jiyanekî dikeve jiyaneke nû, mirov û tiştî nû dibîne. Ji vî alî de em pir bi baldarin, bila dilê dayîkan rehet be.”

## FERHENGA BIWÊJAN

**Rûbirû bûn:**
- Gotin dan rûyên hev; hatin hemberî hev; pirsgirêk di navbera wan de derketin.

**Ser nîşangeha tifingê re li hev dinêrin:**
- Pir ji hev aciz in; dijminên hev in; pir ji hev hêrs bûne.

Siha wî dide ber guleyan.
- Keyfa wî jê re nayê; jê pir aciz e; nexwaze bibîne.

**Sînorê min û wî ji hev venagerin:**
- Nabe ku ez û ew dijberiya hev bikin.

**Weke cin û hesin in:**
- Ji hev pir aciz in; ji hev re weke dijmin in.

(Dibêjin cihê hesin lê hebe cin xwe nadin wir)

**Weke mişk û pisîkê li ber hev in:**
- Ji hev pir aciz in; bi hev nakin.

**Wê kevir bi ser me de bibarin:**
- Dema yek gotineke li dijî dîn dibêje, hingê tê gotin.

**Xwe jê çavreş kir:**
- Li ber çavê wî reş bû.

**LI SER ÇÊBÛN, PÊKHATIN Û SERKEFTINÊ**

**Cihê xwe dît:**
- Tişta ku lê digeriya dît; xwesteka wî pêk hat.

**Cihê lingê xwe dît:**
- Karê xwe têkûz kir; karê xwe saxlem kir; pêwîstiya wî bi ti kesî nema.

**Çû dam:**
- Bi ser ket.

**Çû qelêç:**
- Bi heman wateyê.

**Dewl berda çalê:**
- Ya xwe bi cih anî; xwesteka xwe pêk anî.

**Di dawiye de ji bo paniya piyê xwe erdekî hişk dît:**
- Di dawiyê de cihekî ku ji xwe re lê bisitire dît.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman




## Rojnameya Ronahî; Bingeha şoreşa ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê ye



Edîtorê beşa Erebî ya Rojnameya Ronahî Refîq Ibrahîm diyar kir ku di 16’ê Cotmeha 2011’an de Rojnameya Ronahî ronî dît, wek yekem rojname ku bû şopdara rastiyê li ser asta Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê hate damezrandin ...**R-5**

## Remzî Kartal: Di çarçoveya manîfestoya Rêber Apo de dem dema rêxistinkirinê ye



Hevserokê Kongra Gel Remzî Kartal diyar kir ku penaberên tên welatên Ewropayê taybetî gelê Kurd di nava pergalê de zehmetiyên mezin jiyan dikin, ji ber ku armanca pergalê civakbûnê ji holê rake. Remzî Kartal destnîşan kir ku ji bo gelê Kurd di çarçoveya manîfestoya Rêber Apo de dem dema rêxistinkirinê ye.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1316 | 15-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ‘RÊ Û STÛNÊN ÇARESERIYÊ RÊVEBERIYA XWESER Û QSD’Ê NE’

Endamê Desteya Rêveber a Nûnertiya Rêveberiya Xweser li Başûrê Kurdistanê, Fethullah Hisên diyar kir ku hişmendiya paşverû ya hikumeta veguhêz û destwerdana dewleta Tirk di Sûriyê de rêyên çareseriyê asteng dikin. Herwiha Fethullah Hisên destnîşan kir ku rê û stûnên çareseriya pirsgirêka Sûriyê, Rêveberiya Xweser û QSD’ê ne.**R-4**



## ‘Zivistan ji bo koçberên kampan zor e’



Koçbera ji Serêkaniyê Şemsa Ehmed diyar kir ku bi hatina zivistanê re pêwîst e her kes alîkariyê bide koçberan, ji ber ku zivistan ji bo koçberên kampan tehluke ye û got: “Rêxistinên mirovî li gorî berjewendiyên dewletan tevdigerin û erkên xwe ji bîr kirine.”**R-6**

## Diyar Yûsif darê bêdeng vedguherîne tabloyên zindî



Li quncikek biçûk a stodyoya xwe ya sade li yek ji taxên bajarê Qamişlo, ciwanê bi navê Diyar Yûsif darê bêdeng vediguherîne tabloyên hunerî ku çîrokên bedewî û berxwedanê vedibêjin. Bi çavên tijî coş, Diyar Yûsif xwe di nav hûrguliyên wêneyê de vedişêre.**R-7**

## Ma gengaz e di serdema ku 8’ê Adarê bi Jin Jiyan Azadî tê xemlandin, were rakirin!




Yek ji rojên dîrokî yên ku hatine tunehesipandin di biryara /188/ a hikumeta HTŞ’ê de 8’ê Adarê ye. Ji bilî ku di civakê de tu rol ji jina Sûrî re nehiştiye, roja 8’ê Adarê ku ji çar aliyên cîhanê jin pîroz dikin, ew jî layiqî jinên Sûriyê nedît û rewa nehesiban.**R-2**

Jina koletiyê dipejirîne esîl tê dîtin
Nehîr pale R-2


Encamên danûstendê wê bi qutkirina destê Tirkiyê xuya bibe
Dilyar Cizîrî R-4


Piştî aştiya li Xezayê
Farûk Sakik R-5

# Ma gengaz e di serdema ku 8'ê Adarê bi Jin Jiyan Azadî tê xemlandin, were rakirin!

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Yek ji rojên dîrokî yên ku hatine tunehesipandin di biryara /188/ a hikumeta HTŞ'ê de 8'ê Adarê ye. Ji bilî ku di civakê de tu rol ji jina Sûrî re nehêştiye, roja 8'ê Adarê ku ji çar aliyên cîhanê jin pîroz dikin, ew jî layiqî jinên Sûriyê nedît û rewa nehesiban. Hikumeta HTŞ'ê bi biryara /188/ a ku derxistiye re, tê de destnîşan kir ku Cejna Newrozê, Cejna Ekîdo û 8'ê Adarê ne rojên fermî di dîroka Sûriyê de ne. Bi tunehesbandina van dîrokên ku xwe dispêrin bi hezaran salan, Hikumeta heyî îradeya gelê Kurd, Suryan û îradeya jinê tune dike. Helbet ev ne kiryarên nû ne ku li ser dîrok û rojên netewî yên gelê Kurd û gelên din yên Sûriyê de tê meşandin. Hikumeta Baas jî bi heman polîtîkeyê tevdigeriye. Li şûna Roja 21'ê Adarê ku hemû gelê Kurd pîroz dikirin, ew roj bi roja Cejna Dayîkan rewa kir, ji ber li hember îradeya gelê Kurd nikarî xwe ragirtiba, bi hinceta ku Cejna Dayîkê ye ev yek derbas kir.

Lê belê Roja 8'ê Adarê di Sûriyê de ji berê ve dihat betlanekirin û hemû jinan pîroz dikirin. Helbet em ê nebêjin ku ew rêjîm gelek baş bû, lê belê Rojeke cîhanî li pêşiya cavên cîhanê tune nekir û di rojên taybet de xwedî cih bû.




### Nêrînek li 8'ê Adarê

Bûyera ku hêştiye rojeke cîhanî ji bo jinên gerdûnê bê veqetandin û pîrozkirin, ji bûyerek ji rêzê nehatiye. Di dîroka vê cejnê de çîrokên bi sedan jin ku hatine kuştin û qetilkirin hene.

Fikirê vê rojê di destpêka sedsala bîstan de derket ku di Di 8'ê Adara 1857'an de, bi hezaran karkerên jin li kargehên tekstîlê yên New Yorkê xwepêşandan kirin û daxwaza başkirina şert û mercên xebatê, mûçeyên wekhev û mafê dengdanê dikirin, dest pê kir. Lê belê di encama grevê de kargeha jinan hate şewitandin û bi qasî 100 jinî di encamê de mirin. Ev bûyer muhra xwe li guhartina zihniyeta zilam xist û weke gavên destpêkê yên jinê ber bi bidestxistina mafê xwe ve bû. Neteweyên Yekbûyî di sala 1977'an de ev roj bi fermî wekî sembolek cîhanî ya têkoşîn û mafên jinan pejirand.

Roja cîhanî a jinan girîngiya rola jinan di pêşxistina qadên çandî, civakî û aborî de radixe ber çavan. Bi balkişandina ser pirsgirêkên ku ew hîn jî pê re rû bi rû dimînin, wek şiddeta navmalî, cudakariya li cîhê kar, û derfetên newekhev ên perwerdehî û siyasî.

8'ê Adarê roja teqdîr û rêzgirtinê ye, peyama hevgirtinê ye ji bo her jina ku hewl dide xwe îspat bike. her wiha daxwazeke ji bo avakirina cîhanek dadmendtir û wekhevtir ji bo her kesî.

### Hikumeta HTŞ'ê ya Colanî çi siyasetê dide meşandin?

Hikumeteke ku hatiye û xwe weke rêveberiyekî fermî û xelaskarê gelê Sûriyê di roj û şevekê de nîşan da. Tu kî yî, ji kur hatiye, dîroka te çi ye, li ser çi esasê tu bû desthilatdar û ka ew zagon û dadgehên ku ji bo serweriya te a fermî hatine lidarxistin? HTŞ'ê weke ew kesê ku hatiye û kesek li pêşiya xwe nedît, hema ji tunebûnê got "Ez rêveberiya we me" wiha lê hatiye û li gor îmkan û asta ku pê fem dike êdî ji xwe re hilbijartinan çê dike, zagonan derdixe, kesayet û reyadaran erkdar dike. "Ji ferun re gotin tu çawa bû desthilatdar got ji ber kes li hember min nesekinî" mesala Colanî jî wiha ye.

Ger em bala xwe bidinê; hebûna Colanî li ser destyhildatdariyê ne li gor zagonên navnewî û cîhanî yên serokatiyê ye. Bi tu rêbaz û protokolekî zagonî Colanî nebû desthilatdar. Ev yek jî li pêşiya çavên cîhanê hate kirin, û tev dizanin ku ev ne ji rêbazên erkdarkirin û birêvebirina serokatiya welatekî ye. Hele hele Colanî ev kesê ku bi deh caran ji aliyê navnetewî ve hatiye cezakirin û li hember girtina wî bi deh hezarê dolaran pere hatine dayîn.

Zihniyeteke olperest, neteweperest, dîktator û olîgraşî tu bi tu awayî hebûna jin di civakan de qebûl nake. Ma em nizanin ev kesên ku cihê xwe li kêlek Colanî digrin û yên ku Colanî bi wan artêşa xwe avakiriye kî ne. Ev kesên ku bûne sedema herikîna xwîna bi hezaran ji jin, zarok û sivîlan. Niha Colanî bi biryara ku di van cend rojên derbasbûyî de derxistiye re, biryara /188/ dixwaze rengên civakana û îradeya jin bi tunehesibandina Roja dîrokî ya Newroz, Cejna Ekîdo û 8'ê Adarê ji rojên taybet yên Sûriyê tune bike. Ev biryar ji aliyê kê ve hatiye standin gelek girînig e. Ji ew meclis û perlamana ku baweriya wan bi xwe bi hebûna wan nîne, ji aliyê ew kesên ku duh serê jin û zarokan li Reqa û Şengalê qutdikirin û îro hatine xwe kirine rayedar. Ma gelo biryargirtin û diyarkirina çarenûsa gelan bi destê van mirovan dibe?

Ev komên cîhadîst nahêlin ku jin di Sûriyê de bi Roja Cîhanî a Jinan pîroz bike, jê re ew derfet dîsa nehêştiye. Ji bilî ku di meclis, dezgehên biryarê û di zagona ku hatiye sazkirin de cihê jinê tê de nîn bû. Niha tu îtîrafê bi Roja Cîhanî a Jinan 8'ê Adarê jî nake. Bi va zihniyeta zayendperest û olperest ma welatekî wekî Sûriyê ku tê de bi dehan ji rengên pêkhate, ol û baweriyan heye, ma mumkine bê rêvebirin! ji ber wê jî heyanî ku ev desthilatdarî bi awayekî fermî, zagonî û dadmendî neyên ser serweriyê wê tu biryar, hilbijartin û diyarkirina çarenûsa gelan neyê qebûlkirin.

### Berteka jinên azadîxwaz

Li hember vê biryarê hemû jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bertekên xwe nîşan dan ku nabe roja 8'ê Adarê di dîroka Sûriyê de bê piştguhkirin û rojek taybet jê re neyê veqetandin. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo hemû dîrokên pîroz yên ku xwe dispêrin bi hezar û dehên salan rabûn ser xwe û berteka xwe nîşan dan. Roja 8'ê Adarê ya ku her diçe li çar aliyên cîhanê bi felsefeya Jin Jiyan Azadî tê xemilandin û pîrozkirin, Hikumeta Colanî hatiye bi zihniyeta ku me li hember wê bi deh salan têkoşîn kiriye, hewildide ji nû de ji holê rake. Helbet ev yek ne mumkine. Lê di aliyê din de divê jina Sûrî li hember ev kiryar û tunehesibandina rola wê di civakê de bê deng nesekinîba. Bêdengiya vê serdemê tê wateya xwe bi xwe kuştinê. Ji lewra li hember hemû rengên tunehesibandin, paştguhkirin, di cihê biryarê de negirtin, divê q;r'na hebûn û têkoşîna xwe bilind bike.

## Ji Pênûsa Jin

### Jina koletiyê dipejirîne esîl tê dîtin

**Nehîr Pale**

Civaka zayendperest li gorî zîhniyeta mêr rêgez, exlaq û zagonan ji jinê re datîn e. Wê fêr dikin çawa bibe qurbana malbat û civaka xwe, ji temenekî biçûk heyanî ku mezin dibe her tim ditirse gotin li ser malbat û eşîra wê werin gotin. Heyanî hestuyên jinê pê didin hîs kirin ku şeref û namûs ji jiyana wê girîngtir e. Ne tenê li civakekê, gelek civak hene ku pesna bêdengî û koletiyê didin. Jinê tînin rewşa mirinê hêvî bike ango ne tenê carekê bi hezarê caran wê dikujin.

Tirs jinê dighîne asta çavên xwe ji her tiştî re bigre û hemû şert û mercan tehemul bike. Li Tebqa, Reqa û Dêra Zorê jina tûndî, bêheqî û zilm lê were kirin û tehemul bike, esîl pênase dikin. Pesnê wê didin ji ber ew her tiştî tehemul dike. Jinê fêr dikin ew çiqasî tehemul bike; ewqasî esîl e. Li gorî buyerên li herêmê diqewimin diyar dibe ku jin li beramberî vê yekê dikevin nava nakokiyan de. Dema mirinê ji xwe re çareserî dibînin tê wateya ku êdî xwe neçar nabînin tûndî û bêrêziya li wan tê kirin, tehemul bikin. Dibe ku nizanibin zayendperestiyê tehlîl û şîrove bikin, lê belê di aliyê piskolojîk de ne rehetin û hîs dikin ku tiştên ne rast birêve diçin, hene. Mêran her tim hewldane jin lal, ker û kor be ji zanebûnê dûr be û her tim dûrî heqîqetê be. Eger jin dest bi lêgerîna heqîqetê bike wê dawî li zîhniyeta mêr were û jin nema qebûl dike ku mîna berê li gorî rêgez, exlaq û zagonên civaka zayendperest jêre diyarkirine, bimeş e.

Tehemulkirin ne mîna civak nav lê dike, esalet e. Jina li beramberî zihniyeta mêr bêdeng bimîne, kole ye, dawî li hebûna xwe tîne û ji xwe ew berî dawî li jiyana xwe bîne, wê di mejî û ruh de dikujin. Jina nirxê rûmetê hîs neke, cûdahiya di navbera mirin û hebûnê de nizanibe, heqîqeta mêr nebîne, ji xwe ew di koletiyê de fetisî ye.

Civaka zayendperest ne tenê tûndî li jinê dike, yan jî destdirêjiya wê dikin û dikujin, wê dixin rewşa xwîn ji kezeba wê biherike. Mînak, gelek mêr hene dema wê li ser hevjîna xwe bizewcin jê dixwazin jê re li jinekê bigere, piştre wê dixin rewşa ew bixwe biçe ji hevjînê xwe re jinê bixwaze û wî bizewcîn e. Jina hîs bike ku pêl rûmeta xwe kiriye ticarî wê nikaribe rehet bijî. Bêrûmetî koletî ye û civaka zayendperest kêlî bi kêlî îhanetê li jinê dikin. Jina bêdeng esîl pênase dikin û jina têkoşer rezîl dibîn in. Li ber çavên wan jina çek rabike û tevlî şer bibe rezîle û mîna şeref û namûs pêre nemaye. Heyanî ji destê wan tê divê jin ji mutfexê dernekeve û darê mêr li ser serê wê kêm nebe. Jina ji vê razîbe û qebûl bike wê nêzî wê nebin, lê jina vê yekê nepejirîne û serî hilde li ser rûyê erdê cî jêre tine ye û dev jê bernadin heyanî dawî li hebûna wê tîn in.



# Piştî salan ji derbaskirina astengiyan Awaz Mihemed projeya xwe vekir

Piştî salan ji têkoşîn û derbaskirina gelek zehmetî û astengiyan, Awaz Mihemed ji bajarê Girkê Legê karî projeya xwe ya karê destan veke. Ew pispora hunerên destan û ew wekî "xewnek ku piştî jiyaneke zehmet pêk hat" bi nav kir û tekezî li ser pêwîstiya piştgirîkirina projeyên biçûk ên jinan li herêmê kir.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Karê destan ne tenê jêhatîbûn an jî pîşe ne, lê îfadeya nasname û mîrasa çandî ye ku bi nifşan re derbas dibe. Ev huner komeke berfireh ji çalakiyan vedihewîne, ji bo afirandina hilberîna bêhempa yên ku di jiyana rojane de têne bikar anîn û kevneşopiyên civakê nîşan dide, jêhatîbûna destan û derûnî hewce dike.

Jin li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê karîbû rola xwe di civakê de derxîne, hebûna xwe di hemû warên jiyanê de îsbat kir, di nav de karên destan ku di dema heyî de bûye qadeke afrîner.

Di malbateke ku hunerên destan dikirin de û di nav topên têl û morîkên rengîn ên li dora odeyê belavbûyî de, "Awaz Mihemed" mezin bû. Ew bi xewnekê mezin bû, ku karsaziya wê ya hunerên destan hebe. Awaz evîna xwe ya ji bo nakış, dirûnê û gerandina bi morîk ji malbata xwe mîras girt, lê ji aliyê diya xwe ve, ku pisporiya wê di vî warî de daye wê, pir bandor lê bû.



### Dilsoziyeke ji bo giyanê dayika xwe

Dayika Awaz koça dawî kir û di dilê wê de valahiyek hişt. Salek berê, ji bo ku xewna dayika xwe pêk bîne, wê karsaziya xwe ya hunerên destan vekir Awaz Mihemed wiha dibêje: "Ew ne projeyek e ku dê pere ji min re qezenc bike. Ew xewna diya min bû berî ku bibe xewna min. Ez her roj li dikanê bi hevkarên xwe re dicivim û em kar parve dikin, em mûrîkan dixin, nakiş dikin û li ser daran jî nakiş dikin. Em di karên destan de jêhatî ne û li gorî daxwazên xelkê dixebitin. Her wiha em bi pêşketinan re dimeşin û ji her tiştê nû agahdar in. Ew mala me ya duyemîn e. Em di nav ken, sohbet û pêşwazîkirina xelkên têne cem me dixebitin."

### Xewnek piştî êşê çêbû

Rêwîtiya Awaz bo gihîştina xewna xwe ne hêsan bû. Ew rastî gelek zehmetiyan hat, di nav de nebûna piştgiriya psîkolojîk a têrker ji kesên li dora wê: "Tiştê ku îro balav e berê ecêb bû. Berê, tenê dirûn û nakiş belav bûn. Neqişandina li ser dar û çêkirina perçeyên cûrbecûr ji materyalên cûrbecûr fikrek ecêbû ne belav bû, lê min baweriya xwe bi vê fikrê anî û piştî zêdetirî bîst salan ew fêm kir."

Awaz Mihemed her wiha bang li rayedar û rêxistinên peywendîdar kir ku piştgiriya darayî ji bo projeyên biçûk peyda bikin: "Em xwedî kapasîteya têrker nînin ku projeya xwe berfireh bikin û em hewceyê piştgiriyê ne."




Derbarê berhema yekem a ku Awaz Mihemed li ser xebitiye wiha dibêje: "Dema ku ez hivdeh salî bûm, min qutiyek darîn çêkir û daliqand. Tevî sadehiya berhemê jî, ew di bîra min de maye."

Awaz ji bo pêşxistina jêhatîbûna xwe beşdarî çend çalakî û kursan bû. Yekem tiştê ku wê firot cil û bergek ji bo keçek piçûk li Başûrê Kurdistanê bû. Awira razîbûnê ya li ser rûyê diya zarokê bes bû ku Awaz piştgirî bike ku rêya xwe bidomîne.

Awaz Mihemed wiha dibêje: "Ez di nakiş, xemilandina bi morîk, dirûnê hirî û çêkirina xemilandinên malê de baş im. Deriyê atolyeya min ji bo her keçekê ku dixwaze jêhatîbûna xwe pêş bixe vekirî ye. Ji ber ku ez di keçan de dibînim ku dixwazin fêr bibin, wek mînak dema ku ez ciwan bûm û ez dixwazim piştgiriya têrker a ku min wê demê nedît, bidim wan."

# Diyar Yûsif darê bêdeng vedguherîne tabloyên zindî


**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Li quncikek biçûk a stodyoya xwe ya sade li yek ji taxên bajarê Qamişlo, ciwanê bi navê Diyar Yûsif darê bêdeng vediguherîne tabloyên hunerî ku çîrokên bedewî û berxwedanê vedibêjin. Bi çavên tijî coş, Diyar Yûsif xwe di nav hûrguliyên wêneyê de vedişêre.**

Bi xêzên rast û destdanên bi hizir, Diyar rûyan bi şêwazek ku wekî "şewitandina daran" tê zanîn, wêne dike, hunerek kêmdîtî ku rastbûn û xeyalê bi hev re dike yek, darê bêdeng vediguherîne tabloyên hunerî ku çîrokên bedewî, berxwedaniyê vedibêjin. Bi çavên tijî coş, Diyar Yûsif xwe di nav hûrguliyên wêneyê de vedişêre.


### Nimûneyek hunerî ya bêhempa di nav ciwanên nifşê xwe de

Yûsif ji hejdeh saliya xwe ve li bajarê Qamişlo yê herêma Cizîrê



rêya xwe di cîhana hunerê de afirand, di navbera teknîk û şêwazên cuda de digere, ku ev yek wî di nav ciwanên nifşê xwe de kiriye kesayetek hunerî ya bêhempa, di rêwîtiyek dirêj de tijî coş, westandin, afirînerî û azweriyên bêdawî. Ji nîgarên bi komir û qelemê bigire heya xetnivîsiya erebî, şewitandina dar, kolandina cam, boyaxkirina bi rûn û şêwaza kêm û tevlihev a boyaxkirina bi têlan.

Di du salên pêşîn ên xebatên xwe yên hunerî de, wî bal kişand ser xêzkirina bi komir û qeleman, dûvre berê xwe da xetnivîsiya erebî, hunerek ku wî ji bavê xwe mîras girtibû, ku di vî warî de xwedî behreyek berbiçav bû. Diyar Yûsif bi teqlîdkirinê razî nebû û biryar da ku berê xwe bide teknîkên



wêrektir. Ew fêrî şewitandina daran bû, paşê li ser camê kolandin kir û di dawiyê de gihîşt tiştê ku ew wekî ceribandina xwe ya herî dijwar dihesiband xêzkirina bi têlan.

### Her serpêhatiyek xwedî şopa xwe ye û her tabloyek xwedî çîrokeke xwe ye

Her serpêhatiyek xwedî şopa xwe ye û her tabloyek xwedî çîrokeke xwe ye. Di nav serpêhatiyên wî yên herî berbiçav de, ew yekem kolandina xwe ya li ser cama, ku wêneyekî birayê wî bû, destnîşan dike.

Wênesazî ne tenê jêhatîbûnek e, ew tiştek e ku mirov pê re çêdibe. Hobiyek têrê nake, divê hewesek e hundurîn hebe. Derbarê hilbijartina karakteran ji bo piraniya wêneyên xwe de, ew dibêje: "Ez meyla xêzkirina karakteran dikim ji ber ku ew bi hûrgulî dewlemend in, rû, taybetmendî, por û îfade. Ev hemû dijwariyek xweşik pêşkêş dike, nemaze dema ku ez bi komirê xêz dikim, ji ber ku ew kûrahî û siya bi awayekî ecêb hunerî eşkere dike."

### Stodyoyeke biçûk, armancên mezin

Piştî salan ji hevkariya wî bi Koma Hunerê ya Orkîdeyê re wekî xetnivîs û hunermendê beşdar, Diyar biryar da ku xwe bispêre xwe û stodyoya xwe ya biçûk vekir. Di vî warî de, Diyar Yûsif tekez dike ku armanca wî ji vekirina stodyoyê ne bidestxistina pereyan e û got: "Armanca min bi stodyoyê ne qezenckirina pereyan e, lê belê armanca min ew e ku mirov berhemên min ên hunerî bibînin û gelê me jî wêne û xêzkirinên min bibînin. Ez dixwazim ku karê min neynikek be ku ruhekî hunerî nîşan bide û bigihîje civaka min." Diyar Yûsif xeyal dike ku di pêşerojê de projeyek hunerî ya bi tevahî yekgirtî veke, ku tê de odeyên bêdeng, muzîk û hawîrdorek îlhambexş ji bo fêrkirina hunerê ji zarok û mezinan re hebin.

# Dilîşan û Hogir: Şehîd û rêzanên heqîqetê

Nûçegihana Ajansa ANHA'yê Dîcle Ehmed di salvegera şehadeta Dilîşan Ibiş û Hogir Mihemed de wiha anî ziman: "Em soza hevalên xwe yên rojnamevan ku di oxira derxistina dengê rastiyê û berxwedana gel di şoreşê de şehîd bûne dûbare dikin û rêya wan bişopînin."

**Lîloz Hisên/Kobanê**

Di 12'ê Cotmeha sala 2017'an nûçegihanên ajansa ANHA'yê Dilîşan Ibiş û Hogir Mihemed dema ku nûçeya revîna sivîlên ji deverên di bin kontrola DAIŞ'ê de li Dêrazorê dişopandin rastî êrişekê xwekuj ji aliyê çeteyan ve hatin û di encamê de şehîd bûn.



**Dilîşan Ibiş**

Dilîşan Ibiş di 26'ê Eylûna sala 1991'an li bajarê Kobanê di nava malbateke welatparêz ji dayîk bûye. Dilîşan Ibiş beşdarî şoreşa Rojava bû ji dema destpêkirina wê, di wê demê de Dilîşan peymangeha Rêvebirina Kar li zanîngeha Helebê sala duyem dixwend, lê xwendina xwe temam nekir û tevlî şoreşa Rojava bû.

Dilîşan Ibiş di Radyoya Dengê Kobanê de kar û xebat kir herwiha pêngava rizgarkirina bajarê Minbicê şopand ku di 1'ê Pûşbera sala 2016'an destpê kir.

Delîşan, li gel şehîd Mistefa Mihemed, nûçegihanê Ronahî TV pêngava rizgarkirina gundên Minbicê û piştre jî bajêr ji çeteyên DAIŞ'ê dişopand. Şehadeta Mistefa di 18'ê Tîrmeha 2016'an de, dema ku pêngav dişopand, bandorek mezin li ser wê kir û wê bi biryardariyeke mezin xwest ku rêya wî ya ragihandina rastiyê bidomîne. Di dawiya sala 2016'an de, Dilîşan Ibiş tevlî ajansa ANHA'yê bû weke nûçegihanek meydanî û li bajarê Qamişlo demekê kar û xebat meşand, piştre bû nûçegihaneke şer ji bo belgekirina şerê li dijî DAIŞ'ê. Dilîşan Ibiş beşdarî şopandina pêngava rêzgarkirina Reqayê bû, ku di vê pêngavê di dîroka 12'ê Cotmehê de li gel hevalên xwe Hogir û Rizgar gihaşt asta şehadetê.

**Hogir Mihemed**

Hogir Mihemed di sala 1991'an li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo di nava malbateke ku li ser fikir û felsefeya Rêber Apo di destpêka salên 90'î de nas kir; ji dayîk bû. Tevî hezkirina wî ji xwendinê, lê ew li gel bavê xwe ji zaroktiyê di warê çandiniyê de kar dikir.

Bi destpêkirina şoreşa Rojava Hogir tevlî refên Yekîniyên Parastina Gel bibû û wekî şûfêrê veguhestina çekan û amûrê leşkerî ji bo şervanan kar kir herwiha tevlî hemû hemleyên li dijî çeteyên DAIŞ'ê bû. Bi destpêkirina hemleya Baxozê ji bo rizgarkirina Dêrazorê şehîd Hogir wekî nûçegihan tevlî hemleyê bû, ji bo derxistina heqîqet û êşa şêniyên herêmên ji cîhanê re, dema ku revîna sivîlan ji DAIŞ'ê dişopand di encama teqînekê de di 12'ê cotmeha 2017'an de şehîd ket.

Derbarê salvegera şehadeta nûçegihanên ajansa ANHA'yê Dilîşan Ibiş û Hogir Mihemed, nûçegihana ajansê Dîcle Ehmed ji rojnameya me re axivî.

**'Ji bo derxistina dengê rastiyê gelek rojnamevan şehîd bûn'**

Dîcle Ehmed di destpêkê de şehîdên riya heqîqetê Dilîşan Ibiş, Hogir Mihemed û Rizgar bi rêzdarî bi bîr anî û wiha anî ziman: "Dilîşan Ibiş mînaka hevaltiya rast, fedekar û jina bi hêz bû ku karîbû li hember adet û kevneşopiyên civakê bisekine û ji desthilatdarî û koletiyê re bêje na. Bi deng, pênûs û kamîreya xwe bi nivîsên ku dinivîsand û dîmenên ku digirt êşa civakê derdixist pêş, berxwdan û lehengiya ku şervanan di eniyên şer de ji Kobanê heta Baxozê û rizgarkirina Dêrazorê gav bi gav li ser vê xakê bi kamîreya xwe têkoşîn kir û rastiya ku li ser erdê dihat jiyankirin, têkoşîna ku li hember hêzên tarî û dagirker dihat kirin, şopand."

**'Ji bo derxistina şoreşa Rojava kedek mezin da meşandin'**

Dicle Ehmed diyar kir ku Dilîşan di kar û xebatên xwe de bal dikşand li ser çîrokên jinan û wiha got: "Şehîd Dilîşan bi taybet çêrokên jinên ku ji hovîtiya çeteyên DAIŞê xelas bûn hem dinivîsand û belge dikir, ji bo derxistina şoreşa Rojavayê Kurdiastanê kedeke mezin kir, herwiha destkeftiyên şoreşê û keda ku ji bo şereşê hat kirin kêlî bi kêlî belge dikir.

Şehadeta Dilîşan pir giran bû, piştî şehadeta wê gelek hevalên me yên din şehîd bûn, weke Îsam, Seed, Jiyan û Nazim. Bi dehan hevalên me yên rojnamevan şehîd bûn, çawa ku Dilîşan soz da ji bo şopandina riya heqîqetê hevalê li dû wê jî heman soz dan û gihaştin asta şehadetê. Ji bo em layîqê têkoşîna hevalên xwe derkevin îro em bi pênûs, deng û kamîreya wan têkoşînê berdewam dikin, rastiya ku li ser edrê diqewime berxwedaniya gel û şervanan çi di eniyên şer û di nava civakê de derxînin. Ji bo parastina destkeftiyên hevalên me yên şehîd bi şev û roj em kar dikin û xebatê dimeşînin, şehadeta Dilîşan weke nasnameya jina azad e divê em layîqê wê kedê bin."

Nûçegihana ajansa ANHA'yê Dicle Ehmed wiha gotinên xwe qedand: "Şehîd Hogir, Dilîşan, Nazim û Jiyan pêşengên me ne, li ser vî esasî em kar dikin. Em soza xwe ji bo wan nû dikin, em ê têkoşîn bikin heta em bighêjin civakek azad, jineke azad û rêberek azad ku Rêber Apo bi fîzîkî di nava xwe de bibînin, rastiya berxwedana gelê xwe û berxwedana şerê gelê şoreşgerî, berxewdana şervanên ku niha li hember dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li berxwe didin, em ê bibin dengê berxwedana gel heta em bighêjin Sûriyeke nenavendî û demokratîk."

# 'Zivistan ji bo koçberên kampan zor e'

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Koçbera ji Serêkaniyê Şemsa Ehmed diyar kir ku bi hatina zivistanê re pêwîst e her kes alîkariyê bide koçberan, ji ber ku zivistan ji bo koçberên kampan tehluke ye û got: "Rêxistinên mirovî li gorî berjewendiyên dewletan tevdigerin û erkên xwe ji bîr kirine."**

Piştî êrîşên dewleta Tirk ên di 9`ê Cotmeha 2019`an de li ser bajarê Serêkaniyê û Girê Spî, şêniyên van bajaran ji ber hovîtiya çeteyan bi darê zorê, ji cih û warên xwe hatin derxistin lewre Rêveberiya Xweser ji bo bicihkirina van malbatan, kampa bi navê Waşûkanî di 24'ê Cotmaha 2019'an de ava kir. Bi sed hazaran gelê Serêkaniyê bi darê zorê hatin koçberkirin û di kampan de hatin bi cih kirin, di nava zehmetî û astengiyan de rû bi rû ne. Bêguman bi hatine zivistanê koçberên di kampan de rastî gelek zehmetiyan tên, hin ji wan bê mazot, soba û konên wan hatina qetandin. Di vê çarçoveyê de jina bi navê Şemsa Ehmed ku ji Serêkaniyê ye, bi temenê 50 saliye ku li kampa Waşokanî dijî ji Rojnameya me re axivî.

Şemsa Ehmed di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: "Di her êrîş, û dagirkeriyê de yên ku herî zêde zehmetiyê dikşînin û zirarê dibînin jin û zarok in. Jin di bin şert û mercên herî dijwar de jiyanê diafrînin. Li kêleka wê jî ji bo vegera mal û bajarê xwe berxwedaniyek mezin didin meşandin û vî barê giran dane ser milên xwe. Li herêmên dagirkirî jin rastî lêdan, qetilkirin, destdirêjî û tecawizkirinê tên. Ji ber ku dijmin êdî ji hêza jinan ditirse lewma li cihên ku dagir dike destpêkê dixwaze hêz û îradeya jinan bişkîne. Bêguman em jî bûn qurbanê vê şoreşê ku me mal û milkê xwe li pişt xwe hişt, tenê ji bo jiyaneke bindest em jiyan nekin û nebin koleyê dagirkeran, li ser vê binghê niha em li Kampa Waşokanî niştecih bûne. Jiyankirina li kampan ne hesane, zor û zehmetiyên wê pir in, bi taybet ji bo malbatên ku zarokên wan hene, pir zore ku zarok di nava kampan û koçbertiyê de bijî. Li vir hete pêşeroja zarokan tê winda kirin, kêmaniyeke cidî di jiyana wan de tê avakirin."



**'Dagirkeriya Tirk sûcên dijmirovî pêk tîne û pêwîst e were cezakirin'**

Şemsa diyar kir ku tîmên alîkariyê zêde bi koçberan re nabin alîkar û wiha domand: "Koçber ji aliyê tîmên alîkariyê ve hatine paşguhkirin. Di hundirê kampa Waşokanî û Serêkaniyê de jinên temenê wan mezin, jinên nexweşiyên giran bi wan re hene, zarokên astengdar û nexweş hene pêdiviya wan bi alîkariyê heye. Lê mixabin tu kes alîkarî nade. Rêvberiya Xweser li gorî derfetên xwe dibe alîkar lê hejmar zêde ye. Di heman demê de dewleta Tirk li dijî koçber û xelkên kantona Hesekê şerê avê dide meşandin. Ev yek di kîjan pîvan di çi rêgezên exlaqî de heye. Ev sûcekî dijmirovî ye û pêwîst e were cezakirin, bese ji bêdengiyê re, heya kengî wê dewletên cîhanî xwe ji sûc û kiryarên dewleta Tirk kor û lal bikin, ev nêzîkatî nayê qebûl kirin."

**'Rêxistinên Mirovî li gorî berjewendiyên dewletan tevdigerin'**

Şemsa Ehmed di dawiya axaftina xwe de balkişand ser zehmetî û astengiyên zivistanê û wiha pê de çû: "Ev 6 salin konên koçberan nehatine guhertin û ev dibe sedema gelek nexweşiyan. Sala borî di demsala zivistanê de gelek kon li ber avê çûn. Koçber di rewşek pir xerab de bûn, zarok gelek nexweş ketin. Her sale m daxwaza konan dikin, lê her kes derdê koçberan napirse, ji ber vê yekê her sal diçe rewşa me ber xerabûyinê diçe. Ji bilî konan, pirsgirêkên kenalên av qirêjî jî li kampê zêde ye, gelek zarok ji ber sedemên kenalên avqirêjahiyê nexweşiyê laşî li pêş xistiye û her diçe ev nexweşî belav dibe, me gelek caran daxwaz kir ku were çareser kirin, lê mixabin gotin û daxwazên me tu kes gudar nake. Bi hatine zivistanê ev pirsgirêkên kenalên avqirêjiyê wê zêde bibe û bi xwe re nexweşiyên cûda jî bide avakirin, dema em malên xwe bûn demsala zivistanê jib o me cûda bû, lê niha ji bo koçberên kampan zivistan tehlîke ye. Ma ka mirovahî ka wijdan, pêwîst e her kes alîkarî bide koçberan û bêdengiya xwe bişkîne. Rêxistinên Mirovî li gorî berjewendiyên dewletan tevdigerin û erkên xwe ji bîr kirine. Tenê bi axaftin dibêjin em mafên mirovan diparêzin ger wisa be çima rewşa koçberan nabînin. Em bi hêvî ne ku beriya zivisatanekî hişk were, pirsgirêkên mazot, sobe, konan û kenalên evqirêjiyê were çareser kirin û bêdiviyên koçberan were peyda kirin. di heman demê de alîkariyê ji bo koçberan re were pêşkêş kirin."



# Remzî Kartal: Di çarçoveya manîfestoya Rêber Apo de dem dema rêxistinkirinê ye

Hevserokê Kongra Gel Remzî Kartal diyar kir ku penaberên tên welatên Ewropayê taybetî gelê Kurd di nava pergalê de zehmetiyên mezin jiyan dikin, ji ber ku armanca pergalê civakbûnê ji holê rake. Remzî Kartal destnîşan kir ku ji bo gelê Kurd di çarçoveya manîfestoya Rêber Apo de dem dema rêxistinkirinê ye.

**Navenda Nûçeyan**

Derbarê bandora siyaseta Ewropa li ser Kurdên ku penaberî Ewropayê bûne, hevserokê Kongra Gel Remzî Kartal bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**- Di milê siyasî de heyanî çi astê bandora Ewropa û siyaseta wê li ser Kurdên ku penaberî wir bûne çê bûye û di çi rewşê de dijîn?**

Li welatên Ewropa modernîteya kapîtalîst li ser gelên penaber ku ji welatê xwe ji ber gelek sedemên cûda cûda mecbûr mane derkevin û hatine Ewropa, gelekî bandor dike. Ji ber modernîteya kapîtalîst armanca wê ew e ku civakbûnê ji holê rake, takekesî hilde di nav pergalê kar û xebat, karê cîhanê û karê bigiştî şexî re mijûl bike. Pergal li ser bingehê xebateke rojane ku bikaribe mirovan ji civakê qût bike, çêbûye. Ji ber vê yekê penaberên ku têne welatên Ewropa taybetî gelê Kurd ê çar parçeyên Kurdistanê, di vî warî de li ser zehmetîkî mezin jiyan dikin. Ji bo ku jiyana xwe rêxistin bikin di pirsgirêkên xwe şexî yên aliyê qanûn de, aliyê rewşa penaberiyê, xebat, perwerde û ziman fêrbûnê, ev hemû ji bo penaberan pirsgirêkeke bingehîn e. Pergal li ser gelên çar parçeyên Kurdistanê zexteke mezin çêdike, di vî warî de rewşeke giran a her kesî heye.

Li derve xuya dike ku kî/ê çû Ewropa xwe xelas kir, îş, kar, xebat û azadiya wan heye, ev wekî derve xuya dike. Lê rastiya vê yekê cûda ye, zehmetî û pirsgirêk pir in. Berî her tiştî gelê ku ji bo azadiya xwe li ber xwe bide, têbikoşe û xebatê bike, ji bo van gelek pirsgirêk hene. Tevî van pirsgirêk û zehmetiyan gelên me yên çar parçeyên Kurdistanê ku hatine Ewropa, taybetî gelê me yê bi şoreşa Rêber Apo û manîfestoya azadiyê hişyar bûne li ser vê bingehê xwe nas dikin û bi nirxê şoreşê ve girêdayî ne. Herwiha li çar parçeyên Kurdistanê ev têkoşîna tê meşandin ji bo xwe esas digirin û dixwazin di vê çarçoveyê de bersiva gelê xwe bidin, ango di vî warî de rêxistinekî gelekî cidî heye û ev rêxistin rêxistineke nehiştiye ku penaberên Kurd li Ewropayê berbelav bibe, ango ji civakbûnê derkeve. Gel bi van rêxistinan li hemû bajar û welatên lê jiyan dikin xwe rêxistin kirine, jiyana xwe hem aliyê civakî û hem aliyê siyasî amade kirine.

Niha em dikarin bêjin gelê ku wekî penaber hatine Ewropa, yekî ku hatiye rêxistinkirin bi idîa gelê Kurd e. Gelê Kurd bi giştî li welatên Ewropa û bajarên lê jiyan dikin li ser vê bingehê kar û xebat kirine. Lê tabî li ser siyaseta li Ewropa jî, hem li qada civakî, qada rêxistinên sivîl, medya û hem jî partiyên sisyasî xebatek tê meşandin, dikare di wan waran de jî bi xwe bandor bike, hem jî aliyekî qada navnetewî taybetî. Yanî îro ku çar dorên dinyayê şer û pevçûn e, ji bo jiyaneke azad rewşeke tarî heye, li hemberî vî şerê çar dorên cîhanê, ji bo hemû mirovahiyê zehmetiyeke mezin çêkiriye.

Niha manîfestoya azadiyê, têkoşîna gelê Kurdistanê, şoreşa Rojava û taybetî niha pergala ku Rêber Apo pêşkêş kiriye ji bo sosyalîzma civaka demoratîk, dengekî mezin çêkiriye. Di vê çarçoveyê de gelek dost û gelek hevgirêdanên mezin çêbûye, ne ku tenê li Ewropa, lê li Austiraliya, Keneda, Amerîka Latînî, Rojhilata Navîn û gelek deveran jî, êdî ji bo azadiya gelan, jin û civakeke ekolojîk demoratîk têkoşîna gelê Kurd bûye hêvî.

**- Kurdên penaberî Ewropa bûne heyanî çi astê di milê siyasî de xwe rêxistin kirine û bûne xwedî bandor li ser siyaseta Ewropa û ya navnetewî û çi pêşketin, guhertin û bandor di vî warî de ava kirine?**

Niha di vê demê ji bo gelê me yê li Ewropa û derveyî Ewropa jiyan dikin ê ku xwe rêxistin kirine di nava mecils û komînan de, di vê çarçoveyê de li ser bingeha çi sîwana fedrasyon û çi konfedrasyon di asta welatan û asta qada hemû Ewropa de xwerêxistin kirine ku rêxistina gelê me yê Ewropa bi awayekî têkiliya wî li gel rêxistinên gelê me yê li Austiraliya, Kenada heta derdorên din jî heye. Niha xebatekî herî mezin ji bo piştgiriya pêngava Rêber Apo ya aştî û avakirina civaka demoratîk û ji bo azadiya Rêber Apo wek kampaniya tê meşandin. Li gelek deveran kesên akademisyan, fîlozof, pispor, rewşenbîr û siyasetmedar li hemû welatên Ewropa, qada navneteweyî û gelek deverên din ji bo azadiya Rêber Apo kampaniya tê meşandin û insiyatîf pêş dikeve. Di çarçoveya manîfestoya Rêber Apo ya sosyalîzma civaka demoratîk kar û xebat tê meşandin, ne ku tenê gelê Kurd, belê gelê Kurd, sazî û dezgehên xwe vê xebatê wekî xebatekî bingehîn armanc kiriye û dimeşîne, lê derveyî wê dostên Rêber Apo û dostên gelê Kurd jî xebateke mezin didin meşandin. Li ser vê bingehê em dikarin bêjin ew derfeta ku Rêber Apo ji bo gelên Kurdistanê, Rojhilata Navîn, gelê Kurd, Tirik, Ereb, Faris û gelên herêmê ji bo jiyana azad û demoratîk li ser bingeha azadiya jin û civakeke ekolojîk bê avakirin û li ser vê bingehê jî aştiya herêmê û ya gelan çêbibe, ev niha bûye armanc û hêviyeke mezin. Di vê demê de ji bo piştgiriya şoreşa Rojava xebatekî esasî tê meşandin. Taybetî ew êrişên dewleta Tirk ku dixwaze destkeftiyên şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê bidestxistine, ji bo têkbirina wan êriş û konsebta siyaseta dewleta Tirk tê tehşîrkirin, li hemberî wê kar û xebat tê meşandin. Herwiha aliyekî tevgera jin di qada nevneteweyî de bi cîhanî re li aliyekî dost, heval û hogirên gelên Kurdistanê di çaroveya manîfestoya Rêber Apo de xebatekê dimeşînin.

Niha azadiya Rêber Apo û parastina şoreşa Rojava karekî bingehîn e, di vê çarçoveyê de li hemû welatên Ewropa û deveran kar û xebat di rojevê de tê meşandin, heta azadiya Rêber Apo ku bidest bixin, ev ê berdewam be. Ji ber em dibêjin azadiya Rêber Apo ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd û parastina li pergala şoreşa Rojava ye, ji bo vê yekê xebat di nava çar parçeyên Kurdistanê, partiyên siyasî, şexsiyet û rêxistinên sivîl ê gelê Kurd tê meşandin.




**- Ji bo doz û çareseriya pirsgirêka Kurd, temamkirina berxwedan û têkoşîna ji bo pêkanîna demokrasî, aştî û çareseriyê ya ku li welat tê meşandin, çi kar û xebat ji aliyê Kurdên penaberî Ewropa bûne tê meşandin û heyanî çi astê bandorê li ser raya giştî dike?**

Çiqas qada navneteweyî xebata tê meşandin ji bo aliyekî li manîfestoya azadiyê ya ku sosyalîzma civaka demoratîk esas digire, ev ji bo naskirina manîfestoya azadiyê ye. Aliyekî ji bo ev pêngava Rêber Apo daye destpêkirin itîfaq û piştgirî çêbibe, kar tê meşandin. Aliyê din ji bo şoreşa Rojava bê parastin, li qada navnetewî kar tê kirin. Li gel vana jî aliyekî di nav partiyên sisyasî ku nav gelê Kurd de ji bo yekîtiya partiyên Kurdan, şexiyet, rewşenbîr û akadimisyên Kurdan xebateke di vê çarçoveyê de rojevê de ye û bingehîn e. Pêwîst e derveyî gelê Kurd qada navneteweyî, hem jî nava civaka gelê Kurdistanê, ji bo yekîtiya gelê Kurd di qada civakî û siyasî de pêş bikeve û encam bên girtin, ev niha xebateke bingehîn di rojevê de tê meşandin. Bêguman ji bo van xebatan hemûyan bêje ku rêk û pêke, yan di hemû qadan de xebatên tê meşandin wekî tê xwestin û encam jî tê girtin, mirov bi vî rengî şîroveyekî bike, ev ji rastiyê dûr dibe. Ji ber aliyê rêxistinkirina gel li ser bingeha manîfestoyê, hem jî aliyê kar û xebatên diplomasiyê li Ewropa û qada navneteweyî kêmasî hene. Kêmasiyên bingehîn jî aliyên rêxistinkirinê de ye ku gelê me li hemû welatên Ewropa û derveyî welat tam wekî tê xwestin hîn nehatine rêxistin.

Xebatên bingehîn jî ew e ku em gelê xwe rêxistin bikin, cihê gelê me lê ye em xwe bighînin wir û wan li ser bingeha paradîgma azadiyê, komîn û meclisan rêxistin bikin. Di vî warî de em bikaribin gelê xwe rêxistin bikin, hem jî bibin bersiva demê, bersiva pêngava Rêber Apo û şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Bêguman xebatên tên meşandin di aliyê rêxisitnî û diplomasiyê de, wekî em dixwazin hîn negihiştiye wê astê. Lê belê pêwîst e em bi nirx jî li van xebatan binerin.

Niha di qada navneteweyî de dengê gelê Kurdistanê di aliyê diplomasî û raya giştî de, cihekî girîng tê naskirin. Di vî warî de dostên me li çar dorên dinyayê ji bo xwedîderkirina li manîfestoya azadiyê û li vê pêvajoyê di aliyê siyasî û diplomasiyê de xebatekî cidî tê meşandin. Îro xebatên di nav dostên enternasyonal de gihiştiye wê qonaxê ku êdî zimanê Kurdî di qada navneteweyî de bûye zimanê hevbeş li cîhanê, yê ku ji bo azadiya Rêber Apo, pirsgirêka Kurd û bi giştî Rojhilata Navîn kar dikin di vê çarçoveyê de xizmeta manîfestoya azadiyê dikin. Ev jî ji bo têkoşîna azadiyê û çareseriya pirsgirêka Kurd, asta têkoşîna me nîşan dike ku bi asteke girîng e. Ji bo wê pêwîst e em nirxê têkoşîna hatiye meşandin, bizanibin. Di vê demê de hêviya me zêde ye û em ê deha zêde bikin ku sala 2025'an bi giştî ji bo kampaniya Rêber Apo û şoreşa Rojava di asteke herî jor de encam bigre.

Herî dawî em dikarin vê bêjin ku ev pêvajo ji bo gelê me yên derveyî welat û çar pareyên Kurdistanê, di çaroveya menîfestoya Rêber Apo de dema dema rêxistinkirinê ye, ew jî li ser bingeha komîn û meclisan xwebirêxistin bikin. Di nav gelên Kurdistanê de perwerdekirin û rêxistinkirin bi vê manîfesotyê bingeh bigirin. Ev dem ji bo me seferberiya rêxistinkirin û bilindkirina diplomasiya gel e û ji bo azadiya Rêber Apo bersiva demê ye.

# ‘Ezmûnek tenê ji Colanî re maye’

Fethullah Hisên diyar kir ku ecindat û destwerdana dewleta Tirk li ser hikumeta veguhêz gelekî li pêş e û got, “Colanî di ezmûnên xwe de bi ser neket, tenê ezmûnek maye, ew jî lihevkirineke navxweyî di navbera gelên Sûiriyê de ava bike, destûrekî nû derxîne, li gel QSD û Rêveberiya Xweser gavên hevkariyê bavêje."

**Navenda Nûçeyan**

Danûstandinên Rêveberiya Xweser û hikumeta veguhêz ji 10’ê Adara sala 2025’an ve bi giranî tên domandin, sedem jî reva hikumeta veguhêz ji çareseriya gelên Sûriyê bi Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Aşûr, Turkmenên xwe ve ye. Giraniya asta diyalogê bandorê li rewşa heyî û çareserkirina kirîza Sûriyê dike. Derbarê heman mjarê de endamê Desteya Rêveber a Nûnertiya Rêveberiya Xweser li Başûrê Kurdistanê, Fethullah Hisên ji rojnameya me re axivî.



**‘Radîkaliyeta HTŞ’ê pirrengiyê qebûl nake’**

Fethullah Hisên da zanîn ku radîkaliyet û siyaseta HTŞ’ê pirrengiya pêkhateyên Sûriyê qebûl nake û wiha anî ziman: “Tevî ku peymana 10’ê Adarê di navbera fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyaya Demokratîk Mezlûm Ebdî û serokê hikumeta veguhêz Elşer de hat îmzekirin, lê tu gav li ser rûyê erdê nehatine avêtin ji ber hin sedeman. Sedema sereke ew e ku hişmendî û siyaseta HTŞ’ê hema hişmendiya rêjîma Baas e, ango qonaxa berî û piştî 8’ê Berfanbarê weke hev e û tiştek nehatiye guhertin. Sedema din jî ecindat û destwerdana dewleta Tirk li ser hikumeta veguhêz gelekî li pêş e. Dewleta Tirk Sûriyê weke wîlayeteke Tirkî dihesibîne, ji ber wê jî rojane rayedar û serkirdeyên MÎT a Tirkiyê serdana Şamê dikin. Ji aliyê Tirkiyê ve nayê dîtin ku Sûriyê xwedî serweriyeke, xwedî gel û pêkhateyên cuda ne, hem jî gelên wê di 14 salan de rastî kirîzeke mezin hatiye, ew rê nade ku pêkhateyên wê pirsgirêka xwe bi hev re çareser bikin. Derdê hemû pêkhateyên Sûriyê, demokratî, pirrengî û rûmet ye, lê heta niha ev hemû pêk nehatine, ji ber ku hişmendiya HTŞ’ê ya radîkal hevkar û pirrengiyê qebûl nake. Ji ber van sedemên bingehîn jî danûstandinên di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta veguhêz sar û lawaz mane.”

**‘Tu alî destûr û hilbijartin qebûl nekiriye’**

Hisên destnîşan kir ku hemû aliyên Sûrî destûr û hilbijartinên parlementoyê qebûl nekiriye û wiha domand: “Diyalog çêdibe, Rêveberiya Xwser, QSD’ê, PYD û partiyên siyasî hevdîtinan jî bi hikumeta demkî re çêdikin, lê ev civîn bêencam dimînin. Eger lihevkirinek pêk tê jî dewleta Tirk qebûl nake, ji ber her lihevkirinek di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê de tê wateya destkeftiyekê ji bo gelê Kurd, ev yek jî ne cihê razîbûna Tirkiyê ye. Hikumeta veguhêz, projeya Rêveberiya Xweser weke projeyeke xeter ji bo xwe dibînin sedem jî ew e ku rêveberî xwedî sîstemeke demokratîk e û pirrengiyê qebûl dike, tê de hemû pêkhate, hevkarên biryara siyasî, leşkerî û diblomasî ne. Hikumeta veguhêz hikumeteke demkî ye, Colanî di gelek ezmûnên ku jê re hatin çêkirin, bi ser neket, destûrekî yekreng ferz kir, nikarîbû destûrekî giştî ji bo pêkhateyên Sûriyê saz bike, di roja îro de jî tu alî vî destûrî napejirîne. Di heman demê de hilbijartinên parlemento çêkir, tevahiya gelên Sûriyê ew red kir, hem jî dewletên rojavayî weke Amerîkayê van hilbijartina qebûl nake.”

**‘Rê û stûnên çareseriyê Kurd, Rêveberiya Xweser û QSD’ê ne’**

Endamê Desteya Rêveber a Nûnertiya Rêveberiya Xweser li Başûrê Kurdistanê, Fethullah Hisên tekez kir ku stûna çareseriya pirsgirêka Sûriyê Kurd, sîstema Rêveberiya Xweser û QSD’ê ne û wiha qedand: “Di roja îro de Sûriyê li ser pênc aliyan hatiye parçekirin, eger Ehmed Elşer siyaseta xwe bidomîne wê bibe lehengê parçebûna Sûriyê û wiha got. Ji dêvla Ehmed Elşer bibe amûrek ji bo pêkanîna lihevkirineke navxweyî, lê bû amûrek di destê ecindatê derveyî de û şerê navxweyî li Sûriyê derxist. Di roja îro de ezmûneke tenê ji Colanî re maye, ew jî hêzeke nerim be û lihevkirineke navxweyî di navbera gelên Sûriyê de ava bike, destûrekî nû derxîne, li gel QSD û Rêveberiya Xweser gavên hevkariyê bavêje, eger wiha neke wê dema Colanî ya veguhêz gelekî kurt be. Bila her kes bizanibe rê û stûna çareseriyê ji bo Sûriyê Kurd, projeya Rêveberiya Xweser û QSD’ê ne.”

# Welatê xelkê ji me re nabe war!

**Volqan Elî**

Di destpêka sedsala 20. de Komara Tirkiye bi têkoşîna gelên Kurd û Tirk hate avakirin. Di destpêkê de mercên komara demokratîk li dar bûn. Lê demeke kurt a wekî du-sê sal ev merc bi sedemên cur bi cur sabote bûn. Paşê bi pêşengiya Şêx Seîd û Seyîd Rizayan gelê Kurd berxwedaneke bêhempa nîşan da. Di vê navberê de planên komkujiya sor û spî hev şopandin: Wekî ji gelê Kurd re bêje “Te çima destek da avakirina Komarê?” planên bêçandûzimankirina Kurdan, ji Kurdan valakirina Kurdistanê xistin dewrê: Takrîrî Sûkun, Perwerdeya, Guherîna Alfabe û Cilûbergan, Tehcîr û Îskan û hwd.

Di destpêka salên 1960’an de wekî dibêje ‘şansa vê planê lê da!” çi bû? Ji ber ku piştî şerê cîhanê yê duyemîn gelek welatên Ewrûpayê hilweşîbûn, hin welatên Ewrûpa û taybetî jî Almanya ragihand ku ew ê ji bo xizmeta xwe ji hin welatên wekî Tirkiyê karkeran bistînin!

Tirkiye ku bi taybetî bi plana valakirina Kurdan ji rojhilatê Firatê, behtilîbû, teşhîr bibû, gava ku li ezman li firsendeke wisa digeriya bi vê wesîleyê, firsenda ku li ezmanan lê digerî hema li erdê, li ber destên xwe peyda kir. Bi serde jî dê jê re pere bihatana! Dê hem rojhilatê Firatê ji Kurdan vala bikira, Kurdên Dêrsim, Elezîz, Meletî, Mereş, Enteb û hwd. wekî karker bişanda Ewrûpa û hem jî pereyên ku wan bişanda bixwarana! Wekî ku du çûk, du nêçîr biçin li kevirê wê bikevin!... Heta mirov dikare bêje, kevirê ku li nêçîrên wê biketa jî ne yê komara Tirkiyê bû, Ewrûpayê Kurd (xizmetkar) wekî karker xwestibûn û Kurd jî di destê Tirkiyê de bûn; jixwe dixwest ku wan Kurdan bi şiklekî bandor bike, bihelîne!

Piştî destpêkirina şerê çekdarî yê 15’ê Tebaxa 1984’an heya bi vê dîrokê bi taybetî li Bakurê Kurdistanê bi hezaran gund hatin şewitandin û niştecihên wê hatin mişextîkirin bajar, metrepolên Tirkiyê yan jî Ewrûpayê. Bi taybetî beşa penaberên li Ewrûpayê ji mercên fîzîkî yên welat û Kurdistanê pir dûr ketine, bi helandineke xeter re rû bi rû ne. Helandina li vê derê ji ber ku gelê Kurd bi derûnî û fîzîkî ji Kurdistanê qut dike, pir xeter e! Di çareseriyek ku muhtemel e çêbibe de ji aliyê fîzîkî û civakî ve qetandina wan ji welat û civakên biyanî bi serê xwe pirsgirêkên civakî dê biafirîne. Ya hê girîngtir jî welatê Kurdistaniyan ku wan bi mişaxtîbûna xwe vala kiriye, ji bo gel û civakên din dibe war û welat (Tirk, Acem, Laz, Ereb û hwd) Yanî eger ku tasa Kurdistanê bi ava gelên din were tijekirin, ti kes tenê dilopek jî av nade Kurd û Kurdistaniyan! Di tasa xelkê de jî ti car Kurd nikarin ji xwe re rehetî peyda bikin. Ma çima li Îzmir yan jî Stenbolê, Kurdek ji ber ku bi Kurdî distirê tê kuştin; gelo ne ji ber vê sedemê be?

Di van roj û çend mehên li pêşiya me, çaryeka destpêkê ya sedsala bîstûyekemîn xelas dibe. Niha eger derfet hebûna ku em li van bajar û navçeyên li jor navên wan derbas bûne yên Bakur çavdêriyeke seresera bikin, ji bo ku mirov bêje ev bajar, bajarên Kurdî ne hezar şahid pêwîst e. Ji bo gund û navçeyên vê herêmê jî heman tişt derbas dibe. Yanî li erdnîgariyeke berfireh a (li Bakur) rojhilatê Firatê wekî ku Komara Tirkiye dixwest Kurdîtî pir lawaz bûye. Rewşa aliyê din ê Firatê ewqas ne giran jî be, ne pir cudatir e. Hema ji ber ku planên xêrnexwaz ên dijminên Kurdan rast hatiye, jixwe ev herêm ji Kurdistanê bûyinê hema di cih de dernakeve. Lê Kurdistanî bûn ne xêreke Xweda ya hetahetayî ye. Yanî çi, wateya vê çi ye? Yanî eger Kurd û Kurdistanî, kuder dibe bibe bibe, eger li welatê xwedî dernekevin, bihêlin biçin welatên cuda, çiqas xwe mafdar bihesibîne yan jî bi armanca ekonomîk û bi armancên cur be cur çûyibin, ti kes nikare bêje “em lê xwedî derkevin yan dernekevin, em lê bijîn yan nejîn ev welat welatê me ye”. Dîroka mirovahiyê ya nêzîk şahidê bûyerên wisa ye: Ewrûpiyan di sedsala 15. de parzemîna Amerîkayê dagir kirin. Bi sedan sal qirra gelên xwecihî yên Amerîkayê anîn. Jê bi milyonan qetlkirin. Di encamê de gelên xwecihî hatin tinekirin, parzemîna Amerîka dest pê kir di sed sala 18. û 19. de bibe welatê Ewrûpiyan: Niha di vê mijarê de nîqaş jî nayê kirin! Ne tenê parzemîna Amerîka, Awûstralya û hemû girav û nîv giravên di behrên transatlantîk de bûne welatên Ewrûpiyan yan jî beşên wan ên Qetilên Kastîk.

Em zêde dûr neçin, li ber serê me gelê Azerî heye! Li gorî dîroknasan bi îhtîmalekî mezin Azerî, bi kokê xwe gelekî Arî ye. Lê ew bi xwe jî di navê de her kes dizane ku qewmekî Tûranî ne! Niha Tayip pê forsa xwe dike ku Tirk û Azerî neteweyek in û du dewletên wan hene! Em hê jî xwe nêzîk bikin. Di dîroka Kurdistanê de dema em behsa şêniya Kurdistanê dikin, em beşa Rojhilat timî 15-18 milyon dihesibînin! Çima? Ferqa di navberê de çima wisa mezin e? Ji ber ku piraniya Loristanê, ew bi xwe xwe Kurd nahesibînin. Jixwe ev leyistokek Farsan e, lê niha wisa lê hatiye. Farsan çi kiriye? Bi sedsalan ji beriya vê, bi bêşeke mezin a Loristanê Şîîatî dane qebûlkirin! Lêkolînên dîrokî nîşan didin, ev pêvajo pir bieş derbas bûye. Lê di encam de hem ji ber ferqa mezhebî û hem ferqa zarawayan, li ser wan ferz kiriye ku ew gelekî cuda ne! Jixwe hedefa mezin a neteweperestiya Farsan zeyifkirina Kurdîniyê bûye! Di vê armanca xwe de xuya ye ku ne kêm serkeftî ne! Ji ber xetereyên bi heman awayî ne ku Rêber Apo di hevdîtina xwe ya çend hefteyan berê de bangawaziyek kiriye ku ciwan li welatê xwe vegerin. Ya rast bangawazî ne tenê ji bo ciwantiyê ye; ji bo hemû Kurdistaniyan e. Bi sedema ku ciwan hêza herî dînamîk a civakekê ne, bangawazî li kesayetiya wan e. Eger yek ciwan jî plana dagirkeriyê vala derxîne, ne dûr e ku planên dagirkeriya spî vala derkevin; ji ber ku wêrekî vegirok e: Îro yek, sibê bi dehan bi sedan û du sibê, bi hezaran û bi dehezaran, sê sibê jî bi milyonan!...



## Encamên danûstendê wê bi qutkirina destê Tirkiyê xuya bibe

**Dilyar Cizîrî**

Piştî 8’ê mijdara 2024’an û bi rûxandina rêjîma Baas li Sûriyê rewşeke nû hate jiyankirin. Destê Îran û Rûsiya ji Sûriyê hate derxistin. Komên HTŞ’ê û komên girêdayî dewleta Tirk wiha fam kirin, Sûriyê ketiye destê wan û êdî li gorî nerîn û bîrdoziya xwe dê di xaka Sûriyê de gavan bavêjin.

Lê piştî çend mehan û bi taybet piştî komkujiyên li Perava Sûriyê ku di meha adarê de li dijî civaka elewî pêk hat û komkujiya Siwêdayê ku di meha tîrmehê de li dijî durziyan pêk hat. Desthilata HTŞ’ê ya bi mehan hewl dida xwe wekî nûnerê tevahî gelê Sûriyê nîşan bide û raya giştî bi van îdayan bixapîne, ji ber komên girêdayî dewleta Tirk û kirinên wan ên li derveyî zagon û yasayan, hewldanên rêveberiya HTŞ’ê ên xapandina raya giştî têk çû.

Bi êrişa wan a li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê ku di bin serweriya asayîşa herdû taxan dene de ye, HTŞ’ê hîn zêde isbat kir ku tu bandora wê li ser komên çete yên girdayî dewleta Tirk nîne. Di nava HTŞ’ê de destê dewleta Tirk û istxbaratên wê pir dirêj e. Ji ber vê jî bê aramî, bê çareserî, tevlihevî û kîndarî di nava gelê Sûriyê de hîn zêdetir belav dibe.

Dema mirov li rûdanên li ser erdê dibîne, tevî dereng û li ser erdê hîn pêk ne hatine, lê civînên di navbera Rêveberiya Xweser, QSD’ê û hikûmeta veguhêz a Sûriyê dewam dikin. Her çendî dewleta Tirk gelek hewldandn dike, ew danûstendin werin astengkirin. Rêveberiya Xweser û QSD’ê ji aliyê xwe ve rê nade têkçûyîn pêk were. Bi taybet piştî imzekirina Peymana 10’ê Adarê ya di navbera Fermandarê QSD’ê Mazlûm Ebdê û Serokê Veuhêz ê Sûriyê Ehmed El Şeri de pêk hat. Koalîsyona Navdewletî û Amerîka zextê li rayedarên HTŞ’ê dike, divê hevdîtinên wan bi QSD’ê re dewam bike. Xalên Peymana 10’ê Adarê divê piratîze bibin!. Dewleta Tirk jî ji aliyê xwe ve di nava hewldanan de ye peymanê têk bibe.

Di nava vê nakokiyê de duh şandeya QSD’ê û Hêzên Ewlekatiya Huner serdana Şamê kirin, di mijara ewlekarê û leşkerî de nîqaş hatin kirin. Di vê navberê de di bin zexta dewleta Tirk û destê wê yê di nava HTŞ’ê û hikûmeta veghê de riya çûn û hatinê di navbera herêmên Rêveberiya Xweser û hikûmeta Veuhêz girtine. Nahêlin welatî, nexweş, xwendekar û her wekî din bi rehetî derbasî herêmên din ên Sûriyê bibin.

Ev gav bi destê dewleta Tirk û destê wan ê di nava rêveberiya Şamê de tê kirin. Dixwazin peymanan xira bikin, Ew ê nikaribin xira bikin. Ji ber rayedarên QSD’ê û Rêveberiya Xweser detayên tevgera dewleta Tirk dizanin û rê nadin di mijara Sûriyê de piroveqesyonan bike.

Itîfaqên dewleta Tirk bi hikûmeta Veguhêz jî gavek din a astengkirina danûstendinên Rêveberiya Xweser û Hikûmeta Veguhêz e.

Dewleta Tirk jî dizane ew ê êdî nema karibe bandora hîn zêdetir li rewşa Sûriyê bike. Tişta diyar dibe, di demek ne pir dûr de dê destê Tirkiyê ji xaka Sûriyê were qutkirin. Guhertina di xeta çareseriyê de wê li ser erdê ji wir ve destpê bike.



# Rojnameya Ronahî; Bingeha şoreşa ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê ye

Edîtorê beşa Erebî ya Rojnameya Ronahî Refîq Ibrahîm diyar kir ku di 16'ê Cotmeha 2011'an de Rojnameya Ronahî ronî dît, wek yekem rojname ku bû şopdara rastiyê li ser asta Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê hate damezrandin û got, “Rojnameya Ronahî bi pelên biçûk û hejmareke hindik bû bingeha şoreşa ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Medya li gorî fonksiyonên ku pêk tîne bi gelek awayan hatiye pênasekirin. Em dikarin wê bi gelemperî wekî komek amûr, medya û kanalên ku ji bo veguhestina nûçe, bûyer, agahî an reklaman ji raya giştî re bi rêya medyaya çapkirî, dengî û dîtbarî ya berdest û bandorkirina li civak û kesan têne bikar anîn, pênase bikin.

Îro, medya di siyaseta navneteweyî û şêwazên jiyana civakî de roleke mezin dilîze û bûye tiştekî rojane di her mal û nava destê her kesekî/ê de. Di vê şoreşa berfireh a agahdariyê û teknolojiya ragihandinê de, medyayê bi hemû şêweyên xwe bûye beşek ji jiyana rojane. Rojnamegeriya çapkirî jî di hemû beş û şêweyên xwe de bavê giyanî yê medyayê dimîne.

**Ji bo xizmeta gel biryara damezrandina Rojnameya Ronahî hat dayîn**

Ji ber hesta welatparêziyê, hesta berpirsiyariyê û xwesteka pêşkêşkirina xizmeteke mezin ji gelê xwe re,
komek rewşenbîr û pisporên medyayê ji bo maf, berjewendî û hêviyên gelê xwe, biryar dan ku rojnameyekê derxin ku ji bo pêşvebirina rastiya siyasî, çandî û civakî bixebite û bi hemû pirsgirêkên gelê xwe re eleqedar be. Di heman demê de rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rojava feriz dikir ku rojnameyeke wê taybet rastiyê eşkere bike, hebû. Li ser wê bingehê rojnameya me “Rojnameya Ronahî” bi silogana “Şopdara Rastiyê Ye” di 16’ê Cotmeha 2011’an de li bajarê Helebê, bi taybetî li taxa berxwedanê (Şêx Meqsûd), bi hewildanên kadroyên akademîk ên pispor hate destpêkirin. Ew yekem dezgeha medyayê bû ku rastiya gelê Kurd belge kir û rê li ber pêşvebirina ramanên demokratîk li seranserê Sûriyê û Rojava vekir. Herwiha ew rojnameya yekemîn a ku li herêmê bi armaca derxistina êş, azar, deng, reng, heqîqet û hwd…ve hate damezrandin. Hem jî rojnameya me bi nivîsên xwe serkeftinên gel di nava dîrokê de dineqişîne. Hejmara sifir a rojnameyê li bajarê Helebê hate weşandin, ji ber ew bajarekî xwedî bandor e li Sûriyê.

**Veguhestina navendê li Efrîn û Qamişlo**

Piştî 2 salan ji xebatên rojnameya me li Helebê, ji ber têkçûna ewlehiyê li bajarê wir navenda rojnameya me di dawiya Adara 2013’an de hate veguhestin ji bo Qamişlo û Efrînê. Li van her dû bajaran wekî dû ekîb karên hevbeş didan meşandin ku ekîbek li Efrîn û ekîbek li Qamişlo. Herwiha weşana di navbera her dû ekîban de hevbeş bû, çapkirin li her dû bajaran dihate kirin, belavkarî jî giştî bû. Mixabin piştî dagirkirina bajarê Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve di sala 2018’an de, navenda rojnameyê ya li bajarê Efrîn hate girtin, ev yek jî giraniya kar da ser navenda li bajarê Qamişlo.



Gavên dijwar û îradeyên xurt

Mîna hemû destpêkan, gavên pêşîn ên xebatên “Rojnameya Ronahî” dijwar û carinan jî astengdar bûn, lê îrade û biryardariya xebatê di hemû şert û mercan de û soza ku komê dabû xwe rast derket û rojname di destpêkê de bi 12 rûpelên bi zimanê Erebî û bi qebareya biçûk derket. Piştî ku hejmara 5’an a rojnameyê derket 4 rûpelên wê bi zimanê Kurdî hebûn û di nav salekê de jimara rûpelan zêde bû, bû 16 rûpelên bi zimanê Erebî û Kurdî. Herwiya berî ku rojname sala xwe ya yekem temam bike, hejmara sifir a kovara zarokan “Mizgîn” di 1’ê Îlona 2012’an de derket ku bi perwerde û çanda zarokan ve mijûl e. Kovara Mizgîn ku mehane derdiket, êdî her 15 rojan carekê 5 hezar kovar tê derxistin û belavkirin ku di mehê de her dû car 10 hezar kovar têne belavkirin.

Dema ku rojname di destpêka xebata xwe de bû, ji ber kêmbûna derfetan û nebûna alavên pêwîst xebatkarên rojnameyê bi xeta dest nivîs dinivîsandin, ew xeta dest jî ji bo çapxaneyê dihat şandin û bi vî rengî rojname dihate çêkirin. Herwiha rojnameyê rê li ber pêşkêşkirina ramanên demokratîk, wekheviya gelan, azadiya jinê û hwd… li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê vekir.

**Rojname ber bi pêşketin û guhertinê vê**

Piştî sê salan yekem çapa rojnameyê bi formata mezin di 20’ê Cotmeha 2014’an de hate weşandin, beriya wê ji ber nebûna derferan bi formatên wê biçûk bûn, wê demê hejmar 150 bi Erebî û hejmar 137 bi Kurdî, li kantona Cizîrê hate weşandin. Herwiha rojname di 28’ê Gulana 2018’an de, dest bi weşana rojane ya elektronîkî ya beşê Erebî kir ku di nav de heftê du hejmarên kaxezî yên erebî û kurdî ne, ya erebî 12’e rûpeli in û 8 rûpelên bi zimanê Kurdî ne.

**Pênûsa jin di rojnameyê de**

Pênûsa jinê di “Rojnameya Ronahî” de xwedî taybetiyeke cuda ye. Jinê di rojnameyê de cihekî girîng girtiye ku rûpela girêdayî çalakiyên jinan li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sûriyê giştî û cîhanê hatiye veqetandin. Jin di nava rojnameyê de bi pênûsa xwe ramanên azad ên jinê dinivîse, têkoşîna jinê derdixe û hewldana avakirina civakeke azad dike.

**Rojnameya Ronahî li gorî prensîbên rojnamegeriya demokrat dixebite**

Ji destpêka xwe ve rojnameya Ronahî wekî rojnameyeke siyasî, çandî û civakî li gorî pîvan, prensîb û rêziknameyên rojnamegeriya navneteweyî, rêzgirtina mafên mirovan û beşdarbûna di pêşveçûna rewşenbîrî û cihêrengiya çandî de, xebitiye. Herwiha li ser bingeh û prensîbên neteweyek demokratîk, biratiya gelan, rêzgirtina ji bo pirrengiya çandî, olî û neteweyî, rêzgirtin û qebûlkirina yên din hatiye avakirin.

**Rojnameya Ronahî cihrengiya nivîsên cuda dihewîne**

Rojnameya me bi karmend û şiyanên xwecihî, bi kadroyên ku di saziyên medyaya demokratîk de hatine perwerdekirin û wekî saziyeke medyayê ya ku bi pirsgirêkên civakî ve girêdayî ye dixebite, da ku raman, nêrîn û çandeke azad û demokratîk ava bike. Hem jî rola kes û saziyan bişopîne û ji bo bidestxistina çandeke civakî ya agahdar di hemû beşên civakê de bixebite. Rûpelên wê siyaset, jin, nûçeyên herêmî û cîhanî, rapor û lêpirsîn, herwiha rûpelên li ser civak, çand, aborî, jîngeh, werzîş û tenduristiyê, ji bilî gelek stûn û beşên cihêreng, dihewîne. Rojname dixebite da ku her tiştê çanda hevpar û pirrengiya rewşenbîrî pêş dixe, çap bike û piştgirî bike ku bibe dengê hemû gel û civakan, rûpelên xwe bike qadên berhemdar ji bo geşbûna pirrengiya çandî û rewşenbîrî. Ji ber vê yekê bi berdewamî dixebite, da ku rojname ji bo her kesî be.

**Exlaqê karê rojnameyê**

Pabendbûna bi pirsgirêkên civakê re. Beşdarbûna di avakirina îdeolojiyeke demokratîk a azad de. Çavdêrîkirina rola kesan û saziyan. Bidestxistina çandeke civakî ya agahdar û armancdar ji bo hemû beşên civakê. Ronkirina tevgera civakî ya çandî, siyasî û aborî û destkeftiyên leşkerî di têkbirina terorê de.

Hejmara rojnameyê ya Kurdî ya çapkirî gihaştiye hezar û 316 ya Erebî ya çapkirî jî hezar û 384 û ya elektornîk 2 hezar û 237. Herwiha rojname ya Erebî 5 hezar 400 tê çapkirin, lê 5 hezar 500 tê belavkirin, ji ber ku 100 zêde tê çapkirin, rojnameya Kurdî jî 3 hezar û 750 tê çapkirin û li sernanserî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê têne belavkirin.

Derbarê salvegera 14’emîn a Rojnameya Ronahî, edîtorê beşa Erebî ya rojnameyê Refîq Ibrahîm axivî.

**“Ji aliyê komeke nivîskar û rewşenbîr biryara rojnameyê hate derxistin”**

Refîq Ibrahîm diyar kir ku gelê Kurd di ware ragihandinê de pir zehmetî dîtin û wiha got: “Di Adara 2011’an de aloziya Sûriyê dest pê kir, wê demê bandora xwe li gelê Kurd ê ku ji hemû tiştî hatibû dûrxistin kir û bi taybet di warê ragihandinê de Kurdan pir zehmetî derbas kirin. Ji meha Adarê heyanî 16’ê Cerya Pêşîn hejmareke ji rewşenbîr û nivîksarên Kurd li Helebê li Taxa Şêxmeqsûd gihaştin hev û piştî çend civînan biryar dan ku rojnameyekê bi navê “Ronahî” derxînin. Tev lê hemû aloziyên derketin û derfetên pir kêm di 16’ê Cotmeha 2011’an de Rojnameya Ronahî ronî dît û wek yekem rojname ku bibe şopedara rastiyê li ser asta Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê hate damezrandin. Rojnameya Ronahî bi pelên biçûk û hejmareke hindik bû bingehê şoreşa ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê.”

**‘Rojnameyê heyama du salan pêşketinên balkêş bidest xist’**

Ibrahîm da zanîn ku piştî avabûna rojnameyê bi 2 salan xebatên wê berfireh bû û wiha pê de çû: “Rojnameya Ronahî piştî 2 salan ji kedê kar û xebatên xwe berfireh kir û pêşketinên balkêş bi dest xist. Di 2013’an piştî alozî li Helebê zêde bûn, cihê rojnameyê beşek jê çû bajarê Efrîn û beşê din jî hate veguhestin li bajarê Qamişlo, di navbera her dû beşan de têkiliyeke xurt û baş hebû. Piştî karekî serkeftî di sala 2015’an de hejmara rûpelên rojnameyê zêde bûn. Di heman demê de beşê erebî û kurdî ji hev cuda bûn û 2 hejmar di heftiyê de dihatin çapkirin, ev jî gaveke pir pîroz û balkêş bû. Di 28’ê Gulana 2018’an de navenda sereke ya Rojnameya Ronahî bû Qamişlo, ji ber mixabin Efrîn ji aliyê dagikirina dewleta Tirk û çeteyên wê ve hate dagirkirin. Piştî ku navenda rojnameyê veguherî bajarê Qamişlo biryar hat birin ku beşê erebî 3 hejmar elektironî û 2 hejmar jî kaxezî bin. Herwiha di sala 2024’an de li beşê erebî hejmareke din a elektronîk hat zêdekirin û ta roja îro jî ku em pîrozbahiya sala rojnameyê ya 14’emîn dikin ev xebat berdewame. Rojname roj bi roj pêşketinên mezin bi dest dixîne û dengê rastiyê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dighîne hemû deverên cîhanê.”

**‘Bi sedan nivîsên min di rojnameyê de hatine weşandin’**

Refîq axaftina xwe wiha domand: “Ez yek ji endamên rojnameyê demeke dirêj tê de kar dikim ku ev 12 sal li paş xwe hişt û min di her dû beşên rojnameyê de kar kiriye. Destpêkê ji sala 2014’an heta 2017’an di beşê Kurdî de min kar kiriye û ji 2017’an heta roja îro di beşe erebî cih digirim ku edîtoriya du ropelan dikim a siyasî û nûçe. Ji bilî wî qûnciknivîsên min û çavê bûyerê di ropela siyasî de hefteyê carekê tê weşandin. Ji bilî wê jî bi sedan gotarên min ên siyasî di rojnameyê de hatine weşandin.”

**‘Her dem xizmetkar û dengê gelê xwe bin’**

Refîq Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand: “Rojname heya roja îro bi keda hemû xebatkarên xwe li ser piyan maye û bûye stûnek ji stûnên Ragihandina Azad û şopdara rastiyê. Em 14’emîn salvegera rojnameyê li hemû karmendên wê yên destpêkê û heya roja îro pîroz dikin. Herwiha soz didin ku em ê li ser şopa şehîdên ragihandina azad bimeşin û dengê gelê xwe bighînin hemû cîhanê û her dem xizmetkarê gelê xwe bin.”



## Piştî aştiya li Xezayê

**Farûk Sakik**

Di 7’ê cotmeha 2023’yan de bi êrîşa Hamasê ya li ser Îsraîlê, şerê li Rojhilata Navîn derbasî qonaxek nû bû. Di êrîşa Hamas de, tenê di rojekê de 1139 kes hatin kuştin. Gelek kes jî dîl hatin girtin. Dema li Îsraîl ev yek dibû, bîhna baruta şer li her deverî belav dibû. Her dewlet li gorî bîhna vê barûtê çeperên xwe di ber çavan re derbas kirin. Hemû aliyan, saetên xwe li gorî vî şerî eyar kirin. Di destpêkê de, Tirkiye ew talukeya nêzî wan dibe nedidît. Tirkiye siyaseta xwe li ser dijminatiya Îsraîl bi rêve dibir. Pesnê Hamasê dida. Ew wek qehreman îlan kirin. Li Enqerê, pêşengên Hamasê, bi xalîçeyên sor hatin pêşwazî kirin. Lê piştî ku Îsraîl bersiv da van êrişan, dewleta Tirkiyê li rêyek dina geriya. Li vêderê Rêber Apo tevlî pêvajoyê bû û bi paradîgmayek nû xwest hem gele Kurd û di heman deme de Tirkiyê ji vê talukeye nêz dibe dûr bixe. Dema ku di 22 Cotmeha sala 2023’an de Dewlet Bahçelî bangî Rêber Apo kir, salek bû li ser şerê Hamas û Îsraliyê re derbas bûbû û li Îmralî heyeta dewletê bi Rêber Apo re li rêyekê digeriyan da ku Tirkiyê ji vê talukeya nêz dibe biparêzin. Di van hevdîtinan de Abdullah Ocalan bi taybet şertên parastin û statuya Kurdan jî esas digirt. Piştî ku li Tirkiyê pêvajoya aştî û civaka demokratîk dest pê kir, Îsraîl li rojhilata navîn êdî hêz bû. Îran, Hîzbûllah û Hamas ji Îsraîl darbe li ser hev dixwarin. Xeza hatibû talankirin û valakirin. Li her deverî êdî peyva Filîstin nedihat bikaranîn bi tenê digotin ‘komkujiya Xezayê’. Ji bo koçberên Xezayê li hin herêma digeriyan. Behsa welatên Efrîqa dihat kirin. Hin agahî jî dihatin servîs kirin û digotin; koçberên Xezayê wê li Sûrî werin bicîh kirin. Tirkiye jî dixwest gelen Xezayê û hin endamên Hamasê bîne li Rovayê Kurdistan, li heremên dagirkirî bicîh bikin. Dema ku salek li ser şerê Hamas û Îsraîl re derbasbû li Sûrî rejim hat guhertin. Di vê pêvajoyê de helwesta Tirkiyê ya pêvajoya aştî û civaka demokratik jî hat guhertin. Erdogan bawerî danî ku wê talukeye ber bi Tirkiyê ve tê, bi HTŞ û bi Colanî bide seknandin. Dest bi êrişkirina QSD’ê kir. Lê berxwedan û stratejiya rêverberiya xweser, pêşî li van êrîşan girt.

Di vê navberê de rewşa Xezayê di rojeva cîhanê de bû. Di çarçoveya “Plana aştiyê” ya Amerîkayê de, li Xezeyê agirbest hate ragihandin. Di 13’ê Cotmehê de, bi agirbestê re, di navbera Hamas û Îsraîlê de hevguhertina dîlgirtiyan dest pê kir. Di pêvajoyek waha de li Tirkiyê tevgerek çêbû. Di destpêkê de Nêçîrvan Barzanî û piştî demekê jî wezîrê karê derve yê Iraqê, li Enqerê bûn. Dema ew li Enqerê bûn, Fermandar Mazlûm Abdî û heyeta xwe li Şamê bûn. Hevdîtinên Şamê bi rengekî erênî derbas bû. Ev detay jî Mazlûm Abdî di bernameyek Ronahî TV de, bi raya giştî re parve kir. Di demek waha de şandeyek ji Şamê ber bi Tirkiyê birêket. Erdogan û ekîba xwe (Hakan Fîdan, Yaşar Guler, Îbrahîm Kalin) piştî aştiya li Xezayê di nav lêgerînekêdene. Hêzên ku li Xezayê aştî pêkanîne, divê ji bo Kurdan jî, li Sûrî çareseriyekê ne bi dile Tirkiyê pêkbînin. Ev yek wan ditirsîne. Tirkiye ev pêvajoya li Tirkiyê bi şerê Îsraîl û Hamasê hatî destpêkirin, piştî aştî pêkhat wê nêzîkatiyek çawa nîşan bide emê di rojên pêş de bibînin.